

Analîza Strana *Ez Xelef im* li ser Şopa Dîroka Kurdan ya Sedsala XIXem

The Analysis Of *Ez Xelef im* Song In The Footsteps Of Ninetenth Century Of Kurdish History

Nurdan ŞARMAN**

PUXTE:

Ji ber ku di dîroka Kurdan de zargotina Kurdî, nemaze muzîka Kurdî, çavkanîyeke girîng e, xebatên di vî warî de dikarin di gelek xalên dîrokî de bibin rênîşaner. Li ser vê xetê strana *Ez Xelef im* a bi nav û deng -herçiqas derheqê jêdera stranê de em ne xwediye agahdariyên dorpêç û eseh bin jî- dikare di gelek waran de sedsala XIXem ronî bike û derfeta lêpîrsînên taybet bide destê me. Nirxandina vê stranê dê di nav şert û mercên sedsala XIXem de nerînên me fireh, asoyên me geş bike û çend versiyonên vê stranê dê deriyê xwendinên cuda li ber me veke. Lewre ev stran xwediye rîtm û naverokêke wisan e ku dikare atmosfera sedsala 19mîn a Kurdistanê ya şeran, ya geşandinên polîtîk ku di dîroka Kurdan de bûne sedemên geşandinên girîng bide ber çavan. Ku bi nêrinek din mirov vê stranê bide ber xwe ev yek hem dê derfet bide ku mirov li geşandinên Kurdistanê yê ku din nav dîroka nivîskî

Ez ji Abdulhekîm Kartal û Mirza Baran re spas dikim ku di sererastkirina nivîsa Kurdî de ji min re bûn alîkar.

**** Wanebêj, Zanîngeha Şîrnexê,
Dibistana Bilind a Tûrîzm û
Kargerîya Otelkariyê, Şîrnex,
Türkiye.**

Lecturer, University of Sirnak, School
of Tourism & Hotel Management,
Sirnak, Turkey.

e-mail: nurdanurek@gmail.com

de cih negirtine binihêre û li ser wan ji nû ve bihizre, hem jî dikare li ber me deriyê şopên nirxandineke nû li ser hin şexsiyet û bûyerên ku heya niha bi çavekî ji rastiye û reseniyê dûr hatine nirxandin vebike.

Bêjeyên sereke: "Ez Xelef im", sedsala XIXem, serhildan, berxwedana Êzdînşêr, Şêx Ubeydullah.

ABSTRACT:

Kurdish oral culture especially Kurdish traditional music has a great importance as being a source of Kurdish history. In this sense, *Ez Xelef im* song as being one of the popular representatives of Kurdish folk song is an oral source to clear and examine the nineteenth century of Kurdish history although there isn't any certain information about its meaning. To handle this song with developments of nineteenth century of Kurdish history will provide both having a new historical outlook about that said times and having various evaluations about the meaning of song. *Ez Xelef im* song which has an epic meaning in Kurdish verbal memory is a reflection of that moving period of nineteenth century Kurdish history. Because this song almost has a rhythm and content that reflect the wars, political and politics development in Kurdistan during nineteenth century. From another angle this song also has a lot of hints which provide thinking about developments never handled by written history of Kurdistan and provide evaluating some events and persons which registered to written history by a non-objective way with a new perspective.

Keywords: "Ez Xelef im", nineteenth century, uprising, resistance Êzdînsêr, Shaykh Ubeydullah.

1. DESTPEK

Bi sedem ku Kurd li ser dînamîkên xwe di merheleyên neteweyên din re derbas nebûbûn, piştî şerê cihanê yê yekem zêdetir mehkûmî rewşeke parçebûyî bûn. Dema înkarkirina nasname, piştaftin, zilm û koçberiyê jî bîn hesibandin, "folklorra Kurdî" an jî "çanda devkî" bi taybetî jî muzîka Kurdî, di parastina nasnameya Kurdan a neteweyî de, bû xwediyê roleke sereke. Şêweya jiyana Kurdî, guherînên civakî û zaravayên cuda tev jî şewqa xwe dane vê çanda dewlemend û cure bi cure, nifş bi nifş hatine neqilkirin. Bi saya zargotinê ev yek nifş bi nifş gihîştîye heta roja me; em jî vê çanda dewlemend û qedîm bêpar nemane. Tiştên qewimîne gelek ji wan bi riya muzîkê di hafîzeyê hevpar de cih girtine. Bi vê yekê em dikarin bibêjin muzîka Kurdî bi tena serê xwe kevneşopî, mîrateya bav û kalan, talan û bûyerên dîrokê tomar kirine; ragihandine ber destê me (Çelebi û yên din, 2006). Strana *Ez Xelef im* jî li ser van asanan nimûneyeke xurt û populer a zargotina Kurdî ye. Kê çî wextî, bi çî awayî, bi çî sedemê ev stran gotîye em nizanin. Li ser vê yekê şîroveyên cuda hene, lêbelê dîsa jî mirov bi hêsanî dikare bibêje ku ev stran gelek şopên xurt ji sedsala XIXem di nav xwe de dihevine. Sedem vê yekê beriya şîrovekirin û analîza vê stranê hewce ye nerînên rûniştî yê derbarê sedsala XIXem bîn veçirandin. Ev demajo di heman demê de, di warê hin kêmasî û şaşiyên di berhemên nivîskî yê

derbarê dîroka Kurdistan a sedsala XIXem de û di warê nêrînên cuda li bûyer, qewimîn û şexsiyetên serdemê de lêpirsînekê jî bi xwe re tîne. Ev yek girîngiya strana *Ez Xelef im* bi awayekî dîrokî zêdetir dike.

Di navbera sedsala XVIIIem û XIXem de li dinyayê gelek bûyerên ku rasterast an bi navgînî, bandorên xurt li çarenûsa gelê Kurd kirine qewimîne (Lazarev û Mihoyan, 2013: 105). Strana *Ez Xelef im* wek berhemeke dîroka devkî bi me dide xuyakirin ku di seranserê sedsala XIXem de atmosfera Kurdistanê dibe warê serhildan û berxwedanan¹.

-
- 1 Li hemberî van kesan ku dibêjin piraniya tevgerên Kurd ên sedsala XIXem netewî û serxwebûnxwaz bûn, hinek angaşten din jî hene. Li gorî van angaştan serhildanên Kurd ên sedsala 19emîn ji hişmendiyeke xwerû netewî bêpar bûn û ya rastî tevgerên vê pêvajoyê xwedan daxwazên otonomiyê bûn. Ji ber ku di vê xebatê de armanca sereke ew bû ku derbarê dîroka stranê û wateya wê de çend angaştan pêşniyaz bikim, ez bixwe qet neketim nav nîqaşên kûr ên derheqê netewîbûn an ne-netewîbûna tevgerên Kurd ên sedsala 19emîn. Lêbelê tezên ku min ev stran bi tevgerên wê serdemê re dan ber têkiliyê, bi saya hin angaştan hatin qewinkirin ku wan angaştan jî tevgerên Kurd ên sedsala 19emîn wek tevgerên netewî qebûl dikirin. Wadie Jwaideh di xebata xwe ya “Dîroka Neteweperweriya Kurdî” de destnîşan dike ku serhildanên Kurd ên curbecur ên di sedsala 19emîn û di destpêka sedsala 20emîn de dest pê kirin, ne bûyerên munferît bûn ku bi tenê ji ber têkçûneke aborî an jî bêmemnûniyeteke siyasî çêbûn (Jwaideh, 2014). Hassanpour dibêje, “Şeran û parçekirina Kurdistanê li ser geşedana netewî ya Kurdistan du bandorên sereke, lê dijber derxistin holê. Wan ji hêlekê ve rê li ber Kurdistanê yekbûyî digirtin. Ji hêleke din ve jî rê didan ku ligel herifandin û zilman wek encama serdestiya biyaniyan, hişmendiyeke netewî ava bibe di nav civatekê feodal de ku endamên wê li hemberî malbat, eşîr û warê bav û kalan dilsoz bûn. Xuya ye, netewe û neteweperwerî ku di sedsala 17emîn de li wan deverên dinyayê anakronîzm bûn, di nav şert û mercên taybet ên li Kurdistanê de geş bûn. Hestên neteweperweriyê ku bi eslê xwe ji bendên eşîr û herêmî cuda bûn hem ji hêla takekesan û hem jî ji girseyên civatê hatin derbirîn. Bêguman gelek serhildanên mîrên Kurd ên li dij serdestiya biyaniyan xwedan armanceke tenê bûn: Parastina desthilatiya xwe ya xweserî ku ji bav û kalan ve ji wan re maye. Qasî ku em ji kêm çavkaniyan dizanin, “*Kesên ku rêberiya van serhildanên li dijî serdestiya biyanî kirine mîr û beg bûn ku ji dêvla tevahiya Kurdistanê an jî hin beşên wê hema tenê axa xwe diparastin.*” (Hassanpour, 2005: 127,128, 129). Hassanpour, ji ber ku di navbera neteweperweriya çîna navîn ya serdema me û neteweperweriya wê demê de tevliheviyek çenebe vêya wek neteweperweriyeke feodal bi nav kiriye. Veguhastina neteweperweriya Kurdî bo neteweperweriya çîna navîn di îdeolojiya netewî ya Hacı Qadirî Koyî (1817-1897) de xuya dibe. Koyî li ber rêberên aristokrat ên kevneşopî û çîna ruhbanê radîbû û bo avakirina dewleta Kurd bangî xelkê dikir û ji bo wê armancê jî propagandaya karanîna wêje û zimanê Kurdî jî dikir (Hassanpour, 2005: 131). Pêvajoya ku cara duyem bi parçekirina Kurdistanê dest pê kir (1918) -Kurdistan di nav pênc dewletan de tê dabeşkirin û desthilatiya dewletê di her deverê herêmê de belav dibe- rê li ber yekitiya etnik a gelê Kurd girt (Hassanpour, 2005: 135).

Em ê di vê xebatê de strana *Ez Xelefîm* li ser pênc xalên cuda rave bikin. Şîroveyên li ser naveroka stranê hemî subjektîv in û hinek ji wan li ser şopa îhtimalan dimeşin. Jixwe armanca min ew e ku ev strana ku hinekî atmosfera sedsala 19mîn dide der, li ser nêrînên şexsiyetên girîng ên wê demê hin qenaetên berdest biguherîne. Di şîrove û nirxandina stranê de me hem ji kelepura nivîskî, hem jî ji ya devkî û rîwayetên nav gel sûd girtiye (bi gelemperî rîwayetên li herêma Botan)². Beriya ku em derbasî dahûrandina stranê bibin divê bi gelemperî em li ser şert û mercên sedsala XIX'em bisekinin.

2. DI SEDSALA XIX'EM DE REWŞA KURDISTANÊ YA GELEMPERÎ

Kurdistana ku cara yekem bi Şerê Çaldiranê (1514) ketibû bin deshilatdariya dewleta Osmanî, bi peymanana Qesrê Şîrînê (1639) ku sînorên dewleta Osmanî û Îranê diyar dikir, hema bêje bi tevahî daxilî erdê Osmanî bû. Kurdistan wek berê –digel peymanana navborî jî– salên li pey jî di navbera Osmanî û Îranê de ji ber şerê tixûban bû qada şer. Herçiqas tixûbên fermî yên di navbera van dewletên mezin ên navborî de li cem Kurdistaniyan ne xwedî hikmekî resen bû jî, her du dewletan jî baca uşîrê bi darê zorê ji Kurdistaniyan hildigirt, bi kotekî Kurdistanî jî xwe re dikirin leşker. Bi ser vê yekê jî, Kurdistaniyan heya sedsala XIXem karîbûn bi awayekî xweser bijîn.

Rojhilata Nêzik û ya Navîn ji dawiya sedsala XVIIIem heta serê sedsala XIXem pê ve dibû qada şerên dewletên mêtînger. Dewletên mêtînger wek Rûsya, Almanya, Brîtanya, Frensa û piştî Awistîrya di navbera xwe de plana parvekirina dewleta Osmanî dikirin ku roj bi roj lawaz dibû, hilwedîşiya. Ji aliyekî din, têkoşînên rizgariyê yên neteweyî -ji bilî neteweya tirk- yên gelên din ji bo van berjewendiyên xwe bi kar dianîn, her diçû tehekuma xwe xurt dikirin (Lazarev û Mihoyan, 2013: 107). Rûsya di sedsala 19an de çar caran li hemberî dewleta Osmanî, du caran li hemberî dewleta Îranê şer kiribû û di destpêka van şeran de Kurd li dijî Rûsyayê derketibûn, piştî bi piranî xwe dabûn pişt Rûsyayê.³

2 Ji ber dîroka nivîskî ya Kurdan hatiye manîpulekirin û sedem vê yekê ku Kurd şexsiyetên xwe yên dîrokî û dîroka xwe di çarçoveyê “emîk” de dinirxînin ev rîwayet girîng in.

3 “Di dema seferên artêşa Rûsan ên bi ser Tirkîyeya rojhilat û Îrana rojava de, fermandarên Rûsyayê bi Kurdan re tîkiliyê wisa danîne ku Kurd tenê bibin hevalbendê wan an jî qet nebe bêalî bimînin. Nikare bê gotin ku Rûsyayê piştgirî dida Kurdîstaneke serbixwe, lê digel her tiştî, wekî encama siyaseta Rûsyayê ya li ser rojhilata-nêz a di sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn de, hilweşîna leşkerî û siyasî ya Osmanî û Îranê leztir kiriyê, ev bûye alîkarî ji bo çêbûn û hêzdarbûna tevgera rizgarî û netewî ya Kurd” (Lazarev ve Mihoyan, 2013: 107).

Di vê serdemê de ji bo Kurdistan xaleke girîng jî ew e ku di salên 40 û 60î ên sedsala XIXem de şah û paşayên hikûmeta Îran û Osmanî dezgehên îdarî û polîtîk yên kevn li ser şopa dewletên ewrûpî guhaztine, yeknavendî xurt kirine, bi reformên jakoben tevgeriyane heya ev yek di nav Kurdistan de bûye sedema gengeşî û nexweşiyên (Lazarev û Mihoyan, 2013: 136).

Wek encam ji sedsala XIXem pê ve dewleta Osmanî û Îran ku hem bi hev re hem jî bi Rûsyayê rê di nav şer de bûn, li aliyekî jî dixwestin û hewl didan ku mîrektiyên Kurdistan yê ber bi rizgariyê ve diçûn kontrol bikin. Di vê qada şerê giran de li ser axa Kurdistanê ji çaryeka pêşîn ya sedsala XIXem heya ya dawî, Kurdên ku hem dixwestin rizgar bibin, hem jî dixwestin ji bandorên neyînî yên van reformên dawî xilas bibin û ji ber vê mebestê jî li ser hev gelek caran serî rakirine, ji teref dewleta Osmanî bi awayekî hovane hatine tepisandin. Ev serhildan roj bi roj ber bi tevger û fikreke neteweyî ve diçû, her yek ji ya pêşîn berfirehtir, mezintir dibû (Lazarev û Mihoyan, 2013; Kutschera, 2013; Hassanpour, 2005).

3. STRANA EZ XELEF IM Û ANALÎZA WÊ

Mîrov dikare strana *Ez Xelef im*, ku yek ji stranên Kurdî yên navdar e, wek straneke epîk û anonîm binirxîne. Strana *Ez Xelef im* ku hema bêje li hemû herêmên Kurdistanê hem ji aliyê Kurdên sunnî hem ji aliyê yên din tê zanîn -wek minak Êzîdî, hwd.- xwediyê govendeke taybet e ku li gorî herêman versiyonên vê govendê jî hene. Herçiqas cara yekem kê gotiye, sedema gotina vê stranê çî ye, em xwedî agahdariyên teqez nebin jî ev stran ji paletiyê bigire heya cejn û rojên taybet bi awayekî çê hatiyê gotin.

Strana *Ez Xelef im* ku bi ihtimal ji helbesteke dîrûdirêj hatiye girtin, gelek rêzikên wê ne berdest in û çend hevok û rêzikên wê jî di stranê de nayên xwendin. Lewma em hay ji halê wê yê resen nînîn.⁴ Di rêzik û fonetîka stranê de li ser şîroveyên dengbêj û stranbêjan li gorî herêman hin cudatîyên piçûk hene. Li jêr çend versiyonên stranê hatine rêzîkirin.

4 Gorî riwayetên mirovekî ji Botan ku jî pîr û kalê xwe bihîstiye, ev stran di rastiya xwe de 25 çarîn bûye, piştî 17 çarîn ji teref hin kesan hatiye nivîsîn, çar pênc çarînen stranê jî, ji teref dengbêj û stranbêjan hatine bestekirin. Derbasbûna helbestê li bal stranê ve di navbera salên 1840 û 1847an de ye. (Ev riwayet ji navnîşana vê malperê û ji belgefilma *Ez Xelef im* hatiye girtin. <http://www.cizremedy.com/cizira-botan-ez-xelefim-xelefim--120v.htm> (Cizîra Botan - *Ez Xelef im Xelef im*).

EZ XELEF IM(1)

Ez xelef im
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Ez xelef im xelef im
Êzdînşêr begê Botan e
Xweyê şûrê sedef im
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweyê şûrê sedef im
Êzdînşêr begê Botan e
Gel eşîra bixwendeme
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Gel eşîra bixwendeme
Êzdînşêr begê Botan e
Ez xelefê bi şîvî me
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Ez xelefê bi şîvî me
Êzdînşêr begê Botan e
Xweyê şûrê bi zîvî me
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweyê şûrê bi zîvî me
Êzdînşêr begê Botan e
Gel eşîra bi hêvî me
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Gel eşîra bi hêvî me
Êzdînşêr begê Botan e
Herbolê xweş Herbolê
Hawar e Mîr hawar e Mîr

Hawar e lo!
Herbolê xweş Herbolê
Êzdînşêr begê Botan e.
Bi gumguma daholê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Bi gumguma daholê
Êzdînşêr begê Botan e.
Xweş şer e li qeleqolê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweş şer e li qeleqolê
Êzdînşêr begê Botan e.
Hewrexê xweş Hewrexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Hewrexê xweş Hewrexê
Êzdînşêr begê Botan e.
Bumba bavên Gemrexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Bumba bavên Gemrexê
Êzdînşêr begê Botan e.
Meş em herin ser Şernexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo! (Bafi, 2005: 170-172)

EZ XELEF IM(2)

Ez xelef im, xelef im
Hewar e mîro hewar e,
Ez xelef im xelef im
Ezdînşêr mîrê Botan e
Xwediyê şûrê bî sedef im

Hewar e mîro hewar e
 Xwedîyê şûrê sedef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Li nav eşîran bi gef im
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşîran bi gef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Ez xelefê kinik im
 Hewar e mîro hewar e
 Ez xelefê kinik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bi şîrik im
 Hewar e mîro hewar e
 Xwedîyê şûrê bi şîrik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Li nav eşîran bi rik im
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşîran bi rik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Ez xelefê şûvî me
 Hewar e mîro hewar e
 Ez xelefê şûvî me
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê Misrî me
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşîran bengî me
 Êzdînşêr bege Botan e
 (Cigerxwîn, 1988: 22-23).

EZ XELEF IM(3)

Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im

Êzdînşêr mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bisedef im
 Hawar e mîr hawar e mîr
 Xwedîyê şûrê bisedef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Nav eşîran bigef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Nav eşîran bigef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Ez xelefê kinik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelefê kinik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bişîrik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Xwedîyê şûrê bişîrik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Nav eşîran birik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Nav eşîran birik im
 Êzdînşêr mîrê Botan e
 Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im
 Êzdînşêr mîrê Botan e⁵

5 Versiyona herî belavbûyî ya vê stranê ev e.

Ev beşa xebata me, ji vir pê de li ser riya çend pirsan, analîz û armanca gotina vê stranê dihewîne. Ev serpîrsên ku dikevin pey îhtimalên nîrxandinên cuda li jêr in.

Gelo Kilama Ez Xelef im meydanxwestina Xelefê Şûvî ye ji Êzdînşêr (Yezdanşêr)?

Baweriyêke mezin heye ku di vê kilamê de Xelefê (Xelefê Şûvî) axa, serok an jî rêberê eşîreke bi navê Şûvî, ji Mîr Êzdînşêr meydan xwestiye û mîr gazî şer kiriye. Yek ji wan kesên ev kilam gotine Şivan Perwer e û ew di destpêka kilamê de behsa çîrokeke ku hêz bide vê baweriyê dike. Di destpêka kilamê de Perwer “Çîroka me di derbareyê Xelefê Şûvî û Êzdînşêrê mîrê Botan de ev e.” dibêje û bi devê Xelefê Şûvî wiha diqîre: “*Wa Êzdînşêr! Mîrê Botan! Ka kê piştî xwe spartî Romîyan e? Tu dibêji Xelefê ditirse ji meydan e. Ka were em îro dekê xwe li hev bidin. Emê bibinîn kî berx e, kî beran e!*” Piştî vê, Perwer dibêje ev şerê ku di navbera pêşengekî Botan Xelefê Şûvî û Mîrê Botan Êzdînşêr de dibe, şerê birakujîyê ye; dema Kurd bi Kurd re şer bike Osmanî/Tirk ji vê rewşê qezenc dikin û dûre dest bi gotina kilamê dike.

Eger em li ser rewşa cezakirina kesên li hember deshilatdariya Êzdînşêr derdikin bifikirin, îhtimala meydanxwestina serokê eşîrekê yê bi navê Xelefê Şûvî li hember Mîr Êzdînşêr gelekî zêde ye. Di kilamê de hebûna kesekî ku her dem behsa nav û hêza xwe dike û çavê yê hemberî xwe ditirsîne vê îhtimalê zêdetir dike. Lê di kilamê de îhtimaleke din heye ku Xelefê Şûvî li hember Mîr Êzdînşêr meydanê dixwaze. Sedemên vê îhtimalê jî ev in: Heke Xelefê Şûvî li hember Êzdînşêr meydanê dixwaze û gazî şer dike, çima dibêje “Êzdînşêr mîrê Botan e.” Çima bi pesindarî dibêje “Êzdînşêr mîrê Botanê ye”? Heke Xelefê şûvî biqîriya an jî xîtabî Êzdînşêr bikira, diviya ku hevok bi qertafa tewangê (-ê) biqediya.⁶ Yanê diviya ku hevok wekî “Êzdînşêr mîrê Botanê” bûya. Di vê rewşê de yan bi demê re “ê” bûye “e”, yan jî Xelefê Şûvî meydanê naxwaze û berevajî leqeba wî wekî pesindayînekê tîne zimên. Aliyekî din, Xelef çima wî kesî gazî şer dike û meydanê dixwaze; di heman demê de jî dibêje “mîr hawar e” û jê alîkarî dixwaze? Di kilaman de bêyî li wateya wan bînan nêrîn hin peyv û baneşan îhtimal heye tenê ji bo qafiyeyê hatibin bikaranîn û îhtimal heye bi demê re guherîna dangan jî pêk hatibe. Mînak dibe ku “mîr hawar e” di rastiya xwe de “mîr ha were” be û bi demê re guherîbe. Yan jî dibe ku rastî “mîr hawar e” be û bi demê re bûbe “mîr hawar e”. Em werin li ser gotinên Şivan Perwer ên derbarê kilamê de. Em dikarin bibêjin Şivan Perwer bi gotinên xwe yên di serê kilamê de dixwaze balê bikişê li ser şerên biratiyê yên bûne sedemek ji bo têkçûna serhildanên gelê Kurd û serekên Kurdan ên sedsala 19mîn.

6 Hema bibêje hemû versiyonên devkî û nivîskî yên vê kilamê de ev rêz pênaseya rewşa cihê Êzdînşêr dike. Yanê dawî bi “e”ya lêkera alîkar diqede ne ku bi “ê” ya qertafa tewangê.

Li vir em kevanekê vekin û bibêjin: Ji Xelef re Şûvî tê gotin, wekî serekê eşîrekê be. Di çarçoveya vê xebatê de, li herêma Botan ne di rîwayetên nivîskî de ne jî di agahiyên wan kesên derbarê vê kilamê de axivîne, behsa Xelef û eşîreke bi navê Şûvî nayê kirin. Di vê rewşê de du îhtimal çêdibin: Heke em Xelef wekî kesekî qebûl bikin, wê demê dibe ku Şûvî leqeba wî be, ne ku navê eşîrê be; yan jî Xelef ne navê kesekî ye.

Di hin gotegot û şîroveyan derbarê kilamê de dibêjin ku Xelef jî ber îxaneta li Mîr Bedirxan kiriye jî Êzdînşêrî aciz dibe, jê meydan dixwaze û gazî şer dike. Êzdînşêr bi Osmanîyan re peymanê girê dide û di encama vê de ku dibe sedema dîlketina rêberekî wekî Mîr Bedirxan bi hêz; wekî rewşeke jirêzê serekên alîgirên Mîr Bedirxan li dij desthilatiya Êzdînşêr derketine. Ev îhtimal were hişê mirov jî, jî ber ku Xelef di kilamê de tenê behsa hêza xwe kiriye û behsa Mîr Bedirxan nekiriye, îhtimaleke lawaz e. Îhtimala ku rêzên behsa Mîr Bedirxan dikin negihîştibin ber destê me hebe jî, şîroveya ku Xelefê Şûvî jî ber îxaneta li hember Mîr Bedirxan jî Êzdînşêr hêrs bûbe û ew gazî şer kiribe zêde maqûl naxuye.

Cigerxwîn jî di berhema xwe ya bi navê *Folklorê Kurdî* de dibêje Xelef navê kesekî ye. Lêbelê Cigerxwîn wekî meydan xwestina Xelef li hember Êzdînşêr şîrove nake. Cigerxwîn derbarê kilamê de wiha dibêje: “*Di vir de, Xelef, navê xwe û şûrê xwe û mîrê xwe û hinek jî ji pesnê xwe dane xuyakirin. Çawa, ko navê eşîra xwe ji me re daye xuyakirin. Ji lewra, ev (Xelef) ji eşîra Şûva ye, ko di bin destê mîrê Botan de ye. Çawa, ko em zanîn, ko navê mîrê Botan jî, di ve çaxê de Êzdînşêr bû yan jî Şêrezdîn. Herweku dide zanîn, ko di wê çaxê de, kalanê şûrên xwe sedef dikirin û şûrên Misrî, Kolmisrî gihiştibûn Kurdistanê. Ev dîlok di ber dîlanê re tê gotin û bi giranî vê dîlokê dibêjin û davêjin berhev û li hev vedigerînin û govend milê rastê diçe*” (Cigerxwîn, 1988: 23). Di çarçoveya vê şîroveya Cigerxwîn de, dema Xelef behsa xwe û hêza xwe dike, pê re behsa mîr jî dike û dibêje: “Êzdînşêr Mîrê Botan e.” Belkî bi niyeta fikrên ku ew xwe hevberê mîr dibîne, hetanî xwe ji wî bihêztir dibîne, pêşî lê bigire dibêje. Belkî jî mirov dikare bibêje di şertên wê demê de navê mîran û kirinên wan di neqeratên stran û kilaman de wekî bikaranîneke giştî bûye.

Dema mirov van nirxandinan tevan bide ber çavê xwe, mirov dikare bibêje ku baweriyên derbarê wateya vê kilamê de mutleq ne rast in. Yanê mirov dikare bibêje îhtimal hene ev kilam ne derbarê şerxwestina Xelefê Şûvî be û Xelef jî ne navê kesekî be. Bi vê sebebê di bin sernivîsên pirsên li jêr, wateyên di vê kilamê de tèn tehlilîkirin.

Di piraniya van sernivîsên pirsî de, bi awayekî jî bo Êzdînşêr têkiliyên bihêz tèn raxistin. Di serî de divê em kevanekê vekin. Sebebên van çavkaniyan û sebebên

kêmbûna têkiliya kilamê bi lehengiya Êzdînşêr ve, kêmasiyên wê û rola kilamê ya di vegotina kesekî wekî Êzdînşêr ê dîrokî de çi ye, em behs bikin.

Sebebê bingehîn a şîrovekirina her wekî kilam behsa qehremaniya Êzdînşêr dike belkî jî ew e ku Êzdînşêr bi Osmaniyan re peyman girê daye û li hember kesekî wekî Mîr Bedirxan ku di dîroka Kurdan de gelek girîng e, derketiye. Yanê ev kilam di nava Kurdan de wekî merşa serkeftin û qehremaniyê tê gotin, divê ihtimala pesindayîna kesekî wekî Êzdînşêr ku rola îxanetê jê re tê dîtin, zêde bi mantiqî lê neyê nêrin.

Neteweyekî wekî Kurdan ku dîroka wan bi destên kesan -bêyî objektîviyê- hatiye nivîsîn, dema ku dîroka xwe dinirxînin car caran van agahiyên tewş û çavkaniyên nerast ji xwe re çavkanî digirin û dikevîne şaşiyê. Kurd (an jî kesên li ser navê wan diaxivin û dinivîsin) dema kesekî dîrokî an bûyerekê bi nêrîneke nûjen dinirxînin û pirsyar dikin dikevîne şaşiyê civakî û encameke wisa derdikeve ku hin ji dîroka Kurdan û hin kesên dîrokî rast neyên famkirin. Va ye qurbanekî vê şaşiya dîrokî û civakî kesekî di dîroka Kurdî de jî Êzdînşêr e. Rola neyînî ya dîrokî (xayîn) ku li Êzdînşêr hatiye barkirin, bûye sebeb ku ew kesê girîng neyê dîtin û neyê nasîn. Di pirtûkên behsa sedsala 19mîn dikin an jî ev serdem jî tê de diborin de navê Êzdînşêr yan bi kurtî dibore yan jî qet nabore. Di çavkaniyên ji bo Kurdan hatine nivîsîn de jî kesekî nezan, sexyekî çavsor, rêberekî sexik, hetanî ku rastî jî kesekî xayînê doza Kurdîtiyê ye. Di pirtûkên dijî Kurdan hatine nivîsîn de, arşîvên Osmanî û Îngilîzî de jî, begekî jirêzê ye yan jî digel ku rehetiya wî û gelê wî di cî de bûye, ew rehet nesekiniye û bûye rêberekî belayê serê Osmaniyan.

Di dîroka devkî an jî hafizeya herêmê de gelek caran, (bi taybetî gelên ku dîroka wan a nivîskî tune an jî ya heyî jî bi awayekî derewîn hatiye nivîsîn) çavkaniyên gelek bihêz tînin dîtin. Dîroka nivîskî gelek caran girîngiyê nade van çavkaniyan û davêje aliyekî. Lêbelê li gorî Pierre Norayê “*Hafize her dem wekî qewimîneke rojane me bi dema bêdawî ve girê dide; dîrok jî tenê nûnertiya paşerojê ye. Dîroka ku bi xwe şîroveyeke rewşenbîrî, sekuler û pevxiştî ye, wekî dij hafizeyê, gotareke rexneyî ye. Dîrok her dem ji hafizeyê şikê dike û ji ber vê jî peywira rastî ya dîrokê dewisandin û tunekirina hafizeyê ye.*” (Nora, 1989: 8-9). Bi hemû berhemên objektîv ên li ser Êzdînşêr hene -ku ne zêde ne jî- û şopên derbarê wî yê di folklorê Kurdî de jî mirov bigire destê xwe, girîngiya Êzdînşêr a di dîroka Kurdî de rastir dikare derîne holê. Ev dê bibe sebeb ji bo lêvegerandina rûmeta Êzdînşêr. Mimkin e di hafizeya devkî de mirov bi îşaretên qehremanî, wêrekî û rêzdariya Êzdînşêr re têkildar gelek efsaneyan bibîne. Beşek ji van efsaneyan di şîroveyên derbarê wateya kilama *Ez Xelefîm* de diborin. Beşek ji efsaneyên derbarê cih û wateya kilama *Ez Xelefîm* a di bîra Kurdan de (yanê baweriya ku ev kilam derbarê qehremanî û şerkeriya Êzdînşêr

de ye) didin nişan ku cih û wateya wê di hafizeya Kurdistan de gelek girîng e. Hinek efsaneyên di vê mijarê de wiha ne:

“Biraziye Bedirxan Êzdîn hebûye. Êzdîn kesekî pir jêhatî û şervanekî baş bûye. Mezinên me digotin Êzdîn fermandarê artêşa Bedirxan bûye. Dema Êzdîn diçû şer, digot: ‘Ez Êzdîn im, ez şêrê mîrê Botan im.’ Elî çawa şêrê Xwedê ye Êzdîn jî şêrê mîr bûye.” “Şêrekî sultanê Osmaniyan hebûye û kesekî nekaribûye li hember wî destê xwe bavêje simbelê xwe. Rojekê Êzdîn rastî vî şêrî tê, destekî xwe avêtiye simbelê xwe û destekî jî daniye ser şûrê xwe û awirekî tûj avêtiye şêrî. Şêrî ji tirsan bi xwe de rîtiye. Ji ber vê wêrekiya wî jê re şêr hatiye gotin; yanê bûye Êzdînşêr.” “Sultanê Osmaniyan du malbatên xanedanî (yek malbata Silêman Beg, a din jî malbata Evdal Beg) ji Botanê sirgûnî Zoqeydê (niha gundekî Misirca Sêrtê ye) kiriye. Li Zoqeydê paşayekî zalim ê Osmaniyan bi navê Fettah Paşa hebûye. Fettah Paşa rojekê êrîşî Evdal Beg kiriye. Evdal Beg xeber ji Êzdînşêr re şandîye û jê alîkarî xwestiye. Êzdînşêr hatiye alîkariyê, Fettah Paşa kuştîye û ji kelhê avêtiye jêr. Paşê jî ji bo bide nişan ku ji Osmaniyan natirse, gotiye ez ê li vir tiştêkî biçînim û heta şîn bibe bi derekê ve naçim. Mîrov şînbûna tiştêkî çandî bide ber çavê xwe, tê famkirin ku Êzdînşêr xwestiye bide nişan ku ji Osmaniyan werine tolhildana Fettah Paşa, natirse. Ev jî delîla wê ye ku ew çiqas rêberêkî bêtirs û wêrek bûye.”

Rîwayeteke derbarê Êzdînşêr a di pirtûka *Dîroka Kelepura Mîrnişîniya Botan*⁷ de jî dîsa nişaneyê wê ye ku Êzdînşêr di hafizeya herêmî ya Kurdî de xwediyê nasnameya şervanî û wêrekiyê ye û di heman demê de kesekî adil e. Ev rîwayet jî bi kurtî wiha ye:

Dema Êzdînşêr heft salî bûye bavê wî Sêvdîn wefat dîke. Piştî vê, mamê wî Bedirxan xwedîkirina Êzdînşêr digire ser xwe. Êzdîn di nava zarên gund de her dem kesekî rêber bûye. Zarok tev di bin emrê wî de ne û listikan piranî Êzdînşêr bi rê ve dibe. Dîsa rojekê zarokên gund di bin rêbertiya Êzdînşêr de bi hespên xwe yên darîn listika şer listibûne. Mîr Bedirxan di wê navberê de bi pêşengên Botan re di civînekê de bûye. Êzdînşêr ji artêşa xwe ya ji zarokan re gotiye “îstîqamet civîn e” û li pêş Êzdînşêr li paş zarok bi hespên xwe yên darîn daketine odeya civîné. Kesên di civîné de li hember vê bûyerê heyirî dimînin û dikenin û paşê Mîr Bedirxan ji Êzdînşêr dipirse: “Ka bibêje tu û artêşa te hûn çi dixwazin?” Êzdînşêr gotiye “Mîrê min ez fermandarê vê artêşê me û leşkerên min birçî ne. Ez ji wan re xwarinê dixwazim.” Bi fermana Mîr Bedirxan ji zarokan re xwarin hatiye anîn û wan jî zikê xwe

7 Ev pirtûk jî aliyê Mele Xelefê Bafî ve hatiye berhevkirin û eslê wê jî rîwayetên destxetî yên Erebbî pêk tê. Di sala 2005an de pirtûk jî aliyê Dîlawer Zengî ve jî bi tîpên latînî ji nû ve hatiye çapkirin (Bafî, 2005).

têr kirine. Piştî vê, Êzdînşêr ji mamê xwe Mîr Bedirxan re gotiye leşkerên Mîrektiya Botan li hember dijmin kêmin û ji vir paş de ez ê artêşa xwe bigihînim, lê ji bo vê jî ihtiyaca min bi pereyan heye. Li ser vê Mîr Bedirxan gotiye tu dikarî baca eşîrekê ji bo ihtiyaca artêşa xwe bicivîni. Êzdînşêr artêşa xwe hildaye çûye mala axayê vê eşîrê. Lêbelê axa feqîr bûye û gotiye ji bilî dîkekî nikare tu tiştî bide wî. Êzdînşêr ev dîk qebûl kiriye û di rê de bi leşkerên xwe yê zarok dîkî dide rûçikandin. Dema Êzdînşêr digihîje ba Mîr Bedirxan, mîr jê pirs kiriye ka baca xwe standiye yan na. Dema Êzdînşêr dibêje min nestand, Mîr Bedirxan sebebê vê pirs kiriye. Êzdînşêr dîkê di destê xwe de dirêjî Mîr dike û dibêje “Mîrê min ha ji te re, tu dikarî tiştêkî ji vî dîkî bistîni? Axayê wê eşîrê jî mîna vî dîkî ye.” Li ser vê Mîr Bedirxan keniyaye û soz daye êdî tu car ji wê eşîrê bacê nestîne (Bafî, 2005: 148-153)

Ev efsane îşaretên girîng in û didine nîşan ku Êzdînşêr di hafizeya Kurdên herêma de ji xayînekî zêdetir qehremanek e. Kesekî wekî Berdixan ku li ser axa di bin hikmê wî de dewlemendiyeke aborî û civakeke di nav xweşiyê de ava kiriye, li Kurdistanê jî mîrîtiyeke serbixwe saz kiriye. Êzdînşêr li hemberî Bedirxan bi Osmanî re tifaq kiriye û bûyê sedema têkçûna Bedirxan. Ev yek jî bûyê sebebê qedandina xweşî û dewlemendiya Botan.

Pêşiya ku em vê tevgera Êzdînşêr bi îxanetî bi nav bikin, divê mercên civakî, çandî û siyasî yê wê serdemê li ber çavan bîn girtin. Çavkaniyên devkî û nivîskî hene ku dibêjin bavê Êzdînşêr Mîr Sêvdîn jî di dema xwe de mîrekî serbixwe bûye. Tê gotin Mîr Bedirxan jî bi Osmanîyan re bûye yek û ev rêberê girîng (Mîr Sêvdînê Bavê Êzdînşêr) ji text xistiye. Lêbelê ne Bedirxan, ne jî Êzdînşêr xwestiye ku Kurdistan bi temamî bikeve bin destê Osmanîyan. Di sedsala 19mîn de peymanên beg û rêberên Kurdan bi Osmanî û dewletên mêtinkar re piranî stratejîk bûne. Bedirxan Beg ji bo bikeve cihê wî bi Osmanîyan re bûye yek û Mîr Sêvdîn ji text xistiye, lê paşê ji bo bi temamî bibe serbixwe bi Osmanîyan re têkoşîn kiriye. Êzdînşêr jî ji bo Bedirxan ji text bixe û bikeve cihê wî bi Osmanîyan re bûye yek, lê ew jî li hemberî Osmanîyan serhildanekê (ji ya Bedirxan bihêztir û berfirehtir) dide destpêkirin û dikeve nava liv û tevgerê ji bo Botan bibe mîrektiyeke serbixwe. Dîsa Şêx Ubeydulahê Nehrî jî bersiva gaziya cîhadê ya Osmanîyan dide û xwe alîgirê wan dide nîşan û piştê bi fikra Kurdistaneke serbixwe serhildaneke mezin daye destpêkirin. Em dikarin şerên mîran wekî şerê textî bibînin û di mercên begîtiya wê demê de em dikarin bibêjin bûyereke jirêzê ye. Zêdetir di wan deman de eşîrên Kurdan di mijara ka dê kî bibe mîr de bûbûne komên cuda. Çawa eşîrên ku dixwestin mîrîti ji Mîr Bedirxan re bimîne hebûn, wisa eşîrên ku digotin divê mîrîti bimîne ji yekî ji mala Mîr Sêvdîn (yanê Êzdînşêr) re jî hebûn. Tê zanîn piştî ku Bedirxan Beg bû mîr jî ev kom bi hev

re di rewşa şer de bûn. Di aliyekî din de ku mirov tifaqa Bedirxan Beg bi Osmaniyan re li ser jîtextxistina Mîr Sêvdîn li ber çavan bigire, Êzdînşêr fikiriye ku mîrîtî heqê bavê wî û piştî jî heqê wî bûye û Bedirxan ev heq xesb kiriye. Bi vê sebebê mirov dikare bifikire ku Êzdînşêr di mercên wê demê de li hemberî Bedirxan Beg (paşê navbera wan xweş bibe jî) bi hêrs bûye.

Wekî encam di mercên begîtiya wê demê de, mirov dikare navandina bi xayîntiyê ya ji bo pevçûnên di navbera endamên xanedanê de wekî şaşiyêke civakî binirxîne. Loma mîrên ku bi tifaqa Osmaniyan re hatine ser text, divê mirov li ber çavê xwe bigire ku wan ji bo têkoşîna rizgariya herêma xwe û tevahiya Kurdistanê xebatên mezin kirine. Ev têkoşînên serweriyê di wê demê de hem ji aliyê malbata xanedanê ve hem jî ji aliyê Kurdistan ve têkoşîneke edetî tê dîtin ku di hafizeya Kurdî ya herêmi de ne Bedirxan, ne jî Êzdînşêr wekî xayîn nayên binavkirin. Ev kes bi şexsiyeten xwe yên pêş û serkeftî her tim hatine vegotin.

Di hin çavkaniyên ku behsa Êzdînşêr dikin de, ev îfade diborin: “*Yezdanşêr di sehneya siyasî ya wê demê de qehremanekî bi nakok lê di heman demê de tîpîk e. Yezdanşêr li aliyekî li ser erdeke kifş berjewendiyên serweriya xwe ya şexsî li pêş girtiye û rêberê feodalê rastîn bûye. Bêrêbazî û nakokiya wî ya siyasî û minêkariya wî ya ku bi desthilatiyan re li hev hatiye, ji vê diqewime. Li aliyên din, ew rexistinkarekî jêhatî û welatparêzekî Kurdistanê bû. Ji bo rizgarkirina axa xwe ketiye nav tevgera serhildanê. Serhildan bi ser tixûbê Botan ketiye û li seranserê Kurdistanê di bin destê Osmaniyan de belav bûye. Tevger di rengê feodaliya cudakî de bû lê xwe gihandiye keviya tevgerê neteweyî.*” (Lazarev û Mihoyan, 2013: 138).

“*Kurdan hurmeteke mezin ji Yezdanşêrî re digirt û heta ku digotin nesla Yezdanşêrî ji ya sultanên Tirk kevnartir û bi rûmetir e.*” (Averyanov, 2010: 101).

Êzdînşêr jî di çavê piraniya eşîrên Kurd de mîna Bedirxan ji malbata Ezîzan û ji nesla Xalid bîn Welîd (Xalidê kurê Welîd) wekî kesekî pîroz e, bi qasî Bedirxan Beg muteber e û mîrîtî jî dema dora wî hat mafê wî yê rewa ye.⁸ Li aliyekî din valahiya desthilatiyê ku piştî Bedirxan Beg çê bûye, tijekirina wê ji aliyê Êzdînşêr ve, di çavê Kurdên bê serek de pêwistiyeke mezin bû. Loma Kurd li hember sefer û tevgerên Osmaniyan ên bi navê tedîbê û li hember rêveberên nû yên Osmaniyan ku dihatin tayînkirin di bin zextên gelek mezin de bûn. Herweha Êzdînşêr di dema serfermandariya Bedirxan Begê de bi şexsiyeta xwe ya şerker û wêrek navdar bûye û ji bo textê valabûyî jî tam lêhatî ye. Alîkariya zarên Bedirxan Begê ji bo serhildana Êzdînşêr jî,

8 Li gora Şerefnameyê Begên Cizîrê ji malbata Ezîzan in ku nesla wan digihêje Xalid bin Welîd (Şerefxan, 1990: 1135).

tîne hişê mirov ku di wê demê de nexweşiya di navbera malbatên Êzdînşêr û Bedirxan Begê de xelas bûye, an jî kêmbûye. Êzdînşêr bi serhildana ku da destpêkirin û gerand, hurmeteke mezin hem di herêma xwe de hem jî di nava Kurdan de qezenc kiriye. Bi ser de jî, (çawa di pêş de dê bê vegotin) serhildana ku ew bi rê ve dibê ji serhildana di dema Bedirxan Begê de jî berfirehtir e.

Gelo ev kilam straneke wekî merşan bû ku leşker û yekîneyên Mîrektiya Botan di şer, berxwedan û serhildanan de gotine?

Me berê jî gotibû sedsala 19mîn di dîroka Kurdan de ji aliyê serhildan, berxwedan û şeran ve serdemeye pir bi hereket e. Di Kurdistanê de di vê serdema ku her serhildan ji ya pêşiya xwe berfirehtir bûye û her serhildan bi xwînê hatiye dewisandin, zêdetir hewcedarî bi motîvasyon û wêrekiyê çê bûye. Folklor taybetiyên dema derketina xwe an jî serdema ku behs dike di xwe de digire. Mirov ku bibêje atmosfera kilama *Ez Xelef im*, atmosfera dîroka Kurdan a sedsala 19mîn e, nabe derew. Loma ev kilam şewqa ruhê şer, serhildan, berxwedan, serkeftin û qehremaniyê dide, mînanî ku cesaret û motîvasyonê bide şervan û gelê Kurd. Di dîroka Kurdan de serhildana pêşîn û mezin a sedsala 19mîn di serdema Mîr Bedirxan de dest pê kiriye. Kilama *Ez Xelef im* ihtimal heye ku ji ber sebebên li jor di serhildana serdema Mîr Bedirxan de hatibe gotin û di serhildanên pişt wê jî zêdetir belav bûbe û berdewam kiribe. Çirokên destekê bidine vê fikrê û wê erê bikin li devera Botan hene. Ev çirok wiha ne:

“Leşkerên artêşa Bedirxan Beg dema diçûne şer ji bo motîve bibin û piştî şer jî ji bo pîrozkirina serkeftinê, ev kilam digotin.” “Bi qasî me ji kalan bihistiye gotina vê kilamê ji aliyê dengbêjan ve, rastî salên 1840 û 1847an tê.” “Dema serkeftineke leşkerî pêk bihata ev kilam bi çoş dihat gotin. Îro jî rojên şahiyê yên wekî dawetan de û dema serkeftinek çêbibe dîsa bi çoş tê gotin.”

Rîwayeteke herêma Botan ku îşaretî hebûna vê kilamê di serdema Bedirxan Beg de dike wiha ye: *“Di dema Bedirxan Beg de, demekê di navbera Goyî û Ertoşiyân¹⁰ de şerek derdikeve. Ewên navbera wan û Bedirxan Beg xweş e, xeberekê dişinin û jê alîkariyê dixwazin. Bedirxan Beg leşkerên xwe ji bo alîkariya Goyiyân dişîne û mezinê eşîra Ertoşiyân tê kuştin û Goyî bi ser dikevin. Piştî vê bûyerê Ertoşî sond dixwin ku heta roja heyfa xwe hildin govenda Ez Xelef im berevajiyê eşîrên din bilizin.”*

9 Serdema ku di bin rêbertiya Bedirxan Beg de serhildana mezin a Kurdî çêbûye.

10 Goyî an jî Goyan eşîreke ku navenda wan li Qilabana Şîrnexê ye. Ertoşî an jî Hertoşî jî konfederasyoneke eşîran e ku jî 12 eşîran pêk tê û belavî Bêtûşebab, Hekarî, Wan û Kurdistanê başûr bûne. Di vê serdemê de Ertoşiyên ku bi Goyiyân re di nava şer de bûn, di nava mîrektiya Hekariyê de di bin desthilatiya Mîr Nûrûlah de bûn.

Govendeke xasî vê kilamê li gelek deverên Kurdistanê heye û awayê vê govendê ya li Botan û derdora wê dişibe hereketên şerî. Govend wiha tê lîstin: Du gav diçin pêş û du gav jî paş ve tînin û gavekê jî dîsa diçine pêş û wiha didome. Ev hereket bi awayê “çûna yek pêş û yek paş” wekî fermaneke leşkerî sembolîze dibe. Dîsa li gora rîwayetên devera Botan “Peyva xelef a di vê kilamê de ne navê kesekî ye, xelef pêşengê şer e, rêvebirê şer e û kesê sergovend be dibe xelef.”¹¹ Li vir peyva xelef (paşhatî) diwateya selefê (pêşhatî) û wekî rêvebirê şer were bikaranîn ne xerîb e. Loma di wê demê de rêvebir û pêşengên şeran pîranî ji malbatên xanedanî ne û fermandar in (wekî Bedirxan Beg, Êzdînşêr û kurên Bedirxan). Guhertoyeke vê kilamê ku li devera Botan bi awayê “Ez xelefê Begê Botan im” tê gotin, vê fikrê piştrast dike.

Ku wisa ye, çima di kilamê de navê Êzdînşêr bi derbdar dibore û kilam bi navê wî navdar bûye? Pêşiya ku em bersivê bidin divê em kevanekê vekin û behsa girîngiya Êzdînşêr û serhildana sedsala 19mîn a di bin femandariya wî de pêk hatiye bikin.

Êzdînşêr kurê Mîr Sêvdînê (Seyfedîn) mîrê berî Bedirxan Beg e.¹² Ji xeynî vê, serfermandarê artêşa Bedirxan Beg e. Êzdînşêrê ku difikire Bedirxan Beg mîrîti ji bavê wî Sêvdîn xesb kiriye, pêşiya ku mereşalê artêşa Anadolê ya Osmaniyan Osman Paşa bimeşe ser Cizîrê (Nîsan 1847) sefa xwe diguhere û ji Cizîrê direve û tevî Osmaniyan dibe. Ji ber endamekî malbata Ezîzan û kurê Mîr Sêvdîn e, ji vê rûmetê hêz digire û di tîkçûna Bedirxan Begê de roleke girîng digire. Piştî Bedirxan Beg di destpêka tebaxa 1847an de teslîm dibe, ji kêrhatina wî ya di tîkçûna Bedirxan de û ji ber endamekî xanedanê ye, ji aliyê mereşalê artêşa Anadolê ya Osmaniyan Osman Paşa ve, wekî muteselimê (wekîltiya mîrêmîran) Cizîr, Botan û Hacîbehramê tê tayînkirin. Lêbelê Sultan Evdilmecîd û hikûmeta Osmaniyan, ji bandora wî ya di nav Kurdan de û rêveberiya serbixwe ya bavê wî (Mîr Sêvdîn) ditirsîn û kesekî ji malbata Bedirxan Begê wekî rêveberê Cizîrê rast nabînin. Di sala 1848an de bi avakirina eyaleta Kurdistanê re Cizîr jî dibe senceq û dema Mustefa Paşayê ku femandarê artêşa Bedirxanê tîk dibe wekî qaymeqam tê tayînkirin, Êzdînşêr dimîne di valahiyê de (Kardam, 2013: 140-141). Ji ber ku pismamê Bedirxan Begî ye tê hizirkirin ku dê bandora xwe di herêmê de zêde bike, loma jî di Adara 1849an de wî dişînin Stenbolê. Paşê jî ji ber Cizîr musaîd nayê dîtin, wî li Mûsilê wekî efser peywirdar dikin. Di vê pêvajoyê de paşayên Osmaniyan bo her derên Kurdistanê ku di bin

11 Ev govend berê li devera Cizîrê pîranî li ber defê dihat lîstin. Stran pîranî bi awayê vegeirîne yanê bi dubareya hemberî tê gotin.

12 Di hin çîrokan de tê gotin ku Mîr Sêvdîn birayê Bedirxan Beg e (Bafî, 2005: 138).

serweriya Osmaniyan de ne, tèn şandin. Hin bajarên kifşe yên Kurdistanê ji aliyê leşkergehên Osmanî ve tèn dagirkirin (Kardam, 2011: 379-380; Ögün, 2010: 66-67, 77-78; Averyanov, 2010: 131).

Bi têkçûna Bedirxan re bidestxistina Kurdistanê tamam bûye û pergala mîrîtiyê hatiye rakirin. Lê bi avakirina eyaleta Kurdistanê û pêkanîna Tenzîmatê, valahiya ku ji tesfîyeya began pêk hatiye nayê tijekirin; di cihê mîrektiyên ku saziyên gelek kevnar û xwediyê kevneşopiyên dîrokî ne, saziyên nû nayên danîn û di vê rewşê de ji teqez xelasiya ji xerabûnên aborî û civakî, bêasayîşî û talanê mumkin nebû. Berteka Osmaniyan a li hember vê rewşê zêdekirina zextan û cezakirina eşîrên bê kontrol bû (Kardam, 2011:384). Zêdebûna bacan, leşkeriya mecbûrî, bi taybetî bertilxwarî û nelirêtiyên rêveberên herêmî dibûn sebebê nerazibûneke mezin. Konsolosê Îngilistanê yê Mûsilê Rassam di rapora xwe ya ji balyozê li Stenbolê Stratford re şandî de wiha dibêje: “*Rewşa zilimkariyê gihîştîye asteke wisa ku Kurdan dest pê kirine li rêberêkî digerin da ku ji nîrê zilma ew xistine bin barekî giran, xelas bibin.*” (Public Record Office [Pro Fo], 195/394, C.A. Rassam to Stratford de Redcliffe, Moossul, 3: 190-192: 1855: Veg: Ögün, 2010: 107). Yezdanşêr wekî endamekî xanedana Cizîra Botan, malbata Ezîzan û kurê Mîr Sêvdîn ji bo lêgerana rêberêkî tam lêhatî bû (Kardam, 2013: 143).

Yezdanşêr biraziyê Bedirxan, di serhildana Botan a di sala 1847an de alî Tirkan kiriye, lêbelê duv re di di sedsala 19mîn de serkişîya serhildaneke herî mezin kiriye. Serhildan bi ser tixûbê Botan ketiye û li seranserê Kurdistana di bin destê Osmaniyan de belav bûye. Tevger di rengê feodaliya cudakî de bû lê xwe gihandiyê keviya tevgerê neteweyî.

Şerê Qirimê yê wê demê dest pê kiriye, rê li ber Êzdînşêr û serhildana wî vedike ku bi pêş ve biçe. Di sala 1853yan de dema Osmaniyan bi Rûsan re şer îlan kir, Kurdan guh nedan celba gazîkirina leşkeriyê.¹³ Di salên 1853-57an de di navbera Kurdan û Rûsan de têkiliyên dostane pêk tèn (Averyanov, 2010: 102-132).

Ji ber ku Yezdanşêr kurê Mîr Sêvdîn bû rêveberiya Cizîra Botan heqê xwe didît û pêşî ji aliyê Bedirxan ve û paşê ji aliyê Osmaniyan ve ev heqê wî hat xesbkirin û ew hat mexdûrkirin.¹⁴ Yezdanşêr li ser vê rewşê çar salên li Mûsilê bi xeyala vî

13 Ewên bersiva vê gaziyê didin ji eşîrên li ser sînorê şerê Rûs û Osmaniyan in ku di bin zextên yekîneyên Osmaniyan de bûn (Averyanov, 2010: 131). Piştî ku Rûs bi ser dikevin Kurdan xwe ji şer vekîşiyane (Averyanov, 2010: 132).

14 Êzdînşêr, dema di serhildana Bedirxan de alîkariya Osmaniyan dikir, hêvî dikir ku dê Osmanî wî wekî waliyê Kurdistanê tayîn bikin. Lêbelê ji ber Osmaniyan nedixwest rêberê navdar ê Kurd bihêztir bibe, destekdayîna wî red kir (Lazarev û Mihoyan, 2013: 139).

heqê xwe yê ji destê wî hatî standin diborîne û ji mehên dawiya sala 1853yan ve li herêma Botanê digere û amadekariya serhildanê dike. Li ser têkçûna Osmaniyan li hember hêzên Rûsan a di havîna 1854an de, vê ji bo bikaranîna planên xwe wek fersendekê dibîne û radibe piyan. Yezdanşêr bi hêzeke 400 kesên ji Mûsilê civandine, hefteya duyem a Cotmeha 1854an ji bo biçê Cizîrê ji Mûsilê vediqete. Serhildan di Kanûna Pêşî ya sala 1854an de tam di navika Kurdistanê de, li başûr û rojhilatê Tirkîyeyê Anadola başûr-rojhilat (eyaletên Botan û Hekarîyê) dest pê dike. Êzdînşêr bi vî awayî di 15 rojan de dibe xwediyê axa edetî ya Mîrektiya Cizîra Botan. Qada serhildanê di sala 1855an de herêma bakurê Kurdistana başûr û Kurdistana başûr-rojhilat digire û ber bi başûr-rohilatê ve belav dibe. Pêşî Kurdên Hekarîyê, dûre Kurdên Miksê û eşîrên Botan tevî Yezdanşêr dibin; di demeke kin de Êzîdî jî di nav de eşîrên din ên Kurd tevî wî dibin. Ji bo serhildanê bifetîsinin, paşayê Bexdayê Kenan leşkergehên Bexda û bajarên din li Sêrtê dicivîne û dimeşe ser Êzdînşêr, lê di navîna meha kanûnê de nêzî Sêrtê têk diçe û direve. Li ser vê serhildanê belavê Bexdayê heta Wanê dibe. Di meha sibatê de êdî 60 hezar kes di artêşa Êzdînşêr de hene, hin çavkanî dibêjin 100 hezar e.¹⁵ Romên li herêmê û 2 hezar jî ji Erebistanê tevî sefên Êzdînşêr dibin. Serhildan di dawiya zivistana 1855an û destpêka biharê de digihîje asta herî jor. Di navbera leşkerên Êzdînşêr û Osmaniyan de li nêzî Keleha Pagvansê ya başûrê Gola Wanê şerek derdikeve. Di vî şerî de 4 hezar miriyên Osmaniyan çêdibin û bi paş vedikişin (Averyanov, 2010: 132-133; Lazarev û Mihoyan, 2013: 139; Kardam, 2013: 142-144; Kardam, 2011: 379-380).

Serhildana ber emrê Êzdînşêr û zêdebûna hejmara alîgirên wî, waliyê Kurdistanê û rêveberên herêmî bi awayekî cidî xistine nava fikaran; tirsîyane ku Êzdînşêrê serhildêr bibe “Bedirxanekî nû”. Waliyê Kurdistanê tirsîyaye ku Bedirxan Beg û Xan Mehmûd ên sirgûnkirî ji Gîrîtê birevin û bêne Kurdistanê. Loma di rewşeke wiha de serhildanê di ji herêma Botan derkeve û heta Miksê bikare belav bibe (Kardam, 2013: 145-146). “Hikûmeta Osmanî (Bab-1 Alî) qebûl kiriye ku serkeftina Êzdînşêr ji bo wan ji destçûna Qers û Erziromê xetertir e (Notên derbarî Kurdên Botan yên Îvanovê Musteşar ku konsolosê kevn ê Erziromê bû û herî dawî bû Konsolosê Helebê, 1877-78, Veg: Averyanov, 2010: 342). Beşeke mezin a artêşa Osmanî ji bo terbiyekirina serhildana Kurdistana mezin a Êzdînşêr di şerê 1854-55an de dema şerê Rûs û Osmaniyan de ji qada şerê eniya Qersê hatiye vekişan (Averyanov, 2010: 104). Bab-1 Alî di naveka 1855an de ji bo serhildana Êzdînşêr bifetîsîne operasyonê dide destpêkirin. 22yê Sibata 1855an de yekîneyên osmaniyan û hêzên Êzdînşêr li Dirûna (îro Duruköy) navbera Mêrdîn û Cizîrê rastî hev tên. Yezdanşêr bi giranî

15 Ne Osmaniyan ne jî Îranê tu demê ji Kurdên bin emrê xwe de ev qas leşker necivandine.

têk diçe, pêşî vedikişê Cizîrê, pê re diçe Qesra Gelî ya li bihurka Qesrikê ku li ser riya Cizîr û Dêrgulê ye (Kardam, 2013: 147). Yezdanşêr dema li Qesra Gelî bûye ji nû ve amadekariyên serhildanê dike û dixebite ku bi artêşa Rûsan re bikeve tîkiliyê, lê nikare bi ser bikeve. Osmanî di vê navberê de serhildêran paşve davêjin. Di dawîya meha nîsanê de Yezdanşêr bi soza namûsê ya konsolosê Îngilistanê li Mûsilê û paşayê Osmaniyan ji Qesra Gelî derdikeve û bi nûnerên Osmaniyan re biryara hevdîtîna dide. Lê di dema hevdîtîna de yekcar tê girtin û dibin Stenbolê û tê zîndankirin. Li ser vê, tevgera Kurdî bê serek dimîne, paş dikeve û di demeke kin de jî xelas dibe (Lazarev û Mihoyan, 2013: 140; Averyanov, 2010: 134; Celil, 1992: 166). Yezdanşêr paşî sirgûnê Vidînê tê kirin. Di Kanûna Paşî ya 1858an de direve û dîsa hewl dide ku serhildanekê rêxistin bike lê tê girtin û dîsa tînin Vidînê. Her çiqas paşî bê efûkirin jî, careke din îzna wî ya vegera Kurdistanê nayê dan (Kardam, 2011: 379-380).

Derbarê girîngiya serhildana Êzdînşêr de ev tîn gotin: *“Tîştê ku serhildana Yezdanşêr ji yên pêşîya wî cudatir dike, himêzkirina axa fireh a Kurdîstana bakur û rojavayê ye.”* (Lazarev ve Mihoyan, 2013: 140). Waliyê Kurdistanê Mehmed Hemdî Paşa di rapora xwe ya 26ê Kanûna Pêşî ya 1854an de ji Derseadetê re şandî de, *“Heke rêbir gihîştibûna armancên xwe, dê ev neguncanî bi vê deverê tenê nemaya û li aliyekî Sêwas û li aliyê din heta Bexdayê belav bûya û dê bûbûya sebebê mesrefên mezin. Di vê rewşê de tevger dê ji serhildana Bedirxan bûbûya pîrsgirêkeke mestir û bi vekirî were dîtin ku her ku biçûya dê derketa çend qatên xwe. Ji dema efsûnkarî (piştî Bedirxan Beg ji holê hat rakirin) li vê herêmê nehatiye dîtin û nehatiye bihîstin ku Kurd wiha bi hev re bûne tifaq û evqas pevçûnên mezin kirine.”* dibêje û kifş dike ku di piştî perdeya vê bûyerê de Yezdanşêr heye (Öğün, 2010, 88-89).

Li vir emê kevanekê bigirin û dîsa vegerin ser mijara bi çi sebebê kilam li ser navê Êzdînşêr hatiye gotin û navdar bûye. Êzdînşêr di serdema Bedirxan de serfermandarê artêşê bûye, bi şerkerî û wêrekiya xwe navdar bûye; dibe ku di vê kilamê de behsa nav û dengê xwe, hêza xwe kiribe û cesaret dabe artêşa xwe. Dibe ku kilam ji aliyê wî bi xwe ve hatibe nivîsîn an jî li ser hatibe nivîsîn û dibe ku gorî mercên wê serdemê ji nû ve bi navê wî hatibe şirovekirin. Li aliyekî din, ji ber ku mîrê herî dawî¹⁶ Êzdînşêr e û eger mirov mezinahiya serhildana di bin emrê wî de, encamên wê û navdarbûna Êzdînşêr li ber çavan bigire îhtimala ku kilam berê hebe û dûre pirtir bi navê wî hatibe xwendin, bêtir derdikeve pêş.

16 Piştî ku Êzdînşêr di sala 1855an de ji holê hat rakirin, dawî li desthilatiya mîran a li herêmê anîn. Lêbelê ji bo demek pir kin Osman Begê kurê Bedirxan mîrîtiya xwe îlan kir. Ji ber ku mîrîtiya Osman Beg pir kin bûye, mirov dikare bibêje Êzdînşêr mîrê dawî ye.

Pirseke din jî ku bê hişê mirov dibe ku wiha be: Eger kilamê di dema serfermandariya Êzdînsêr de dest pê nekiribe, yanê ji pêşî de hebe, yan jî bi sefermandariya wî re dest pê kiribe, çima ji Êzdînsêr re “mîr” tê gotin. Bersivên vê pirsê yên bi ihtimalê wiha ne: Îhtimala hebûna kilamê di pêşiya ku Êzdînsêr bibe mîr (di dema serfermandariya wî an jî pêşî de) ji bo îlankirina mîrîtiya wî, ihtimal heye ji nû ve hatibe şîrovekirin. Loma hin îşaretên ihtimala guherînê hene ku kilama dema serfermandariya wî bi mîrîtiya wî re guheriye¹⁷. Yek ji van jî hin versiyonên vê kilamê li herêma Botan “Êzdîn şêrê mîrê Botan e/Botanê” tê gotin.¹⁸ Çawa tê dîtin li vir behsa Êzdînsêr ne wekî mîr, wekî şêrê mîr tê kirin. Ev çîroka li herêma Botan jî vê ihtimalê piştrast dike: “*Biraziye Bedirxan Êzdîn hebû. Şervanekî pir jêhatî bû. Mezinan digotin ku Êzdînsêr serfermandarê Bedirxan bûye. Dema Êzdînsêr diçû şer, Êzdîn şêrê mîrê Botan e’ digot. Hz Elî çawa şêrê Xwedê ye, ew jî şêrê mîr bûye.*” Di vê rewşê de piştî Êzdînsêr dibe mîr, ristika ‘Êzdîn şêrê mîrê Boten e’ tê gotin ku ihtimal heye bûbe ‘Êzdînsêr mîrê Boten e/Botanê’.¹⁹

17 Li gorî rîwayeteke de vera Botan: “*Dema Êzdînsêr bû mîr, ji bo vê pîroz û îlan bike ev kilam gotiye û şahiyên 40 roj û 40 şevan bidome li dar xistiye.*” Di vê rewşê de, ristika Ez Xelef im (Divê xelef bi wateya dijawateya selefê be. Yanê divê wateya wê “ez xelef im”, “ez paşhatî me” be) a di kilamê de, ristika “*Êzdînsêr mîrê Botan e*” ku tê wateya îlankirina mîrîtiyê û ristika “*Xweyê şûrê sedef im, nav eşîran bengî me*” ku hêz, nav û nîşana mîrê nû hatiye ser text nîşan dide, vê rîwayetê piştrast dikin. Ji bilî vê ristika “*Bi gumguma daholê*” ya ku di wersiyona pirtûka *Dîroka Kelepora Mîrnişîniya Botan* (Bafî, 2005) de dibore, îşaretê şahiyekê dike. Dibe bê gotin ku ristika “*Mîr hawar e*” ya ku di kilamê de dibore jî, tê wateya “mîr îlan dike, mîr gazî dike.”

Baş e, gelo ev kilam/helbest bi mîrbûna Êzdînsêr re hat gotin, an di pêşiya wî de jî li Kurdistanê ji bo mîrbûnê dihat gotin? Îhtimal heye ku ev kilam ji bo hemû mîrên li Kurdistanê ji bo îlankirina mîrîtiyê yan jî cara pêşî ji bo îlankirina mîrîtiya Êzdînsêr hatiye gotin. Heke em ihtimala ku kilam ji bo îlankirina mîrîtiya hemû mîrên Kurdistanê bûye qebûl bikin jî ihtimala ku kilam bi navê Êzdînsêr bûye -ji ber ku mîrê dawî bû û di nava Kurdistan de bi nav û deng bû- divê bê ravekirin û li ber çavan bê girtin.

18 An jî ev ristik di rastiya xwe “Êzdîn, Şêrê Mîrîtiya Botan e” ye û dibe ku deng jê guherîbin.

19 Navê wî yê rastî Êzdîn e û li gorî rîwayetê ji ber ku şervanekî baş û wêrek bûye, “şêr” wekî leqeb li navê wî hatiye zêdekirin. Rîwayeta sebaba dayîna vê leqebê li de vera Botan wiha ye: “*Şêrekî sultanê Osmanîyan hebûye, tu kesî nedikarî simbelê xwe li ber vî şêrî badaya. Êzdînsêr destekî xwe daniye ser simbelê xwe, destek jî li ser şûrê xwe û awirek avêtiye şêr; şêr ji tirsan rîtiye xwe de. Piştî wê rojê ji Êzdîn re Êzdînsêr an jî Şêrêzdîn hatiye gotin.*”

Îşareteke ku îhtimala versiyona kilamê ya di dema serfermandariya wî ku piştî mîrîtiyê guherîbe, piştrast dike dîsa di versiyoneke kilamê ya li herêma Botan veşartî ye. Di hin versiyonên herêma Botan de “Êzdînşêr begê Botanê” tê gotin. Di mîrekiya Botan de mîrên ji xanedanê (çi mîr be çi mîr nebe) bi peyva begê hatine xîtabkirin û ev jî hem di çavkaniyan de hem jî di çîrokên nava gel de tê dîtin. Di serdema fermandariya leşkerî de jê re beg hatibe gotin îhtimal heye ji vê sebebê be. Îcar mirov dikare bibêje piştî ew dibe mîr ev riste ji bo mîrîtiya wî bê nîşandan bi awayê “Êzdînşêr mîrê Botan e” hatiye guhertin.

Baneşana “mîr hawar e” jî li gora şîroveyên vê sernivîsê dibe ku di wateya “mîr diqîre, gazî dike” de hatibe bikaranîn. Xelef jî li gora van şîroveyan di wateya selefê ye û tê wateya paşhatî. Yanê ev peyv (xelef) ji pêşeng, mîr û fermandarên ji malbata xanedanî ya wê serdemê re tê gotin. Êzdînşêr ku ji xwe re “xelef” dibêje (yan jî ku Êzdînşêr re xelef hatiye gotin) ji ber ew kurê Mîr Sêvdîn û nesla malbata xanedanî bûye, peyda bûye.

Di versiyona kilamê ya *Diroka Kelepora Mîrnişîniya Botan* (Bafî, 2005) de ristikên “Gel eşîra bi hêvî me” û “Gel eşîra bi xwende me”²⁰ jî, îşaret dikin ku mîr, rêber an jî fermandar ji bo şer û serhildanê ji eşîran hêviyeke erênî dike; herwiha mirov dikare bibêje ku eşîr ji bo tevlibûna şer û serhildanê tîn motîvekirin. Dîsa di heman pirtûkê de ristikên bi awayê “*Bomba bavên Gemrexê; meşin herin ser Şernexê*” di wesfê gazîkirina şer de ne.

Wek encama nîrxandinên di bin vê sernivîsa pîrsî de; ev kilam di sedsala 19mîn de li Kurdistanê di şer û serhildanan de ji bo tirsandina dijmin, zîndekirin û cesaretkirina ruhê leşkerî û piştî serkeftinê ji bo pîrozbahiyê (mîna marşa mehteranê ya Osmanîyan) kilameke marşî bûye û îhtimal heye ku di her serdemê de li gora bûyer û kesan ji nû ve hatibe şîrovekirin.²¹ Dema em werin ser sebebê ku ev kilam zêdetir bi navê Êzdînşêr û Mîrekiya Botan hatiye nasîn û gotin; hebûna navê

20 Li gorî me di pirtûkê de ev riste şaş hatiye nivîsîn. “bi xwende me” bê wate ye û li kilamê jî nayê, divê rastiya ristikê wekî “Gel eşîra bixwe bendî me” be.

21 Li vir hin taybetiyên din jî hene ku divê li ser bê sekinîn: Di hin ristikên kilamê yê bi awayê “Êzdînşêr mîrê/begê Botan e/Botanê” de tê behskirin ka mîr kî ye an jî dema xîtabî mîr tê kirin ristikên din li gora kesê yekem hatiye kêşan. Li gorî vê (ji ber bi pîranî li gorî kesê yekem hatiye kêşan) kilam li ser navê serhildan û rêberê wê dihat gotin û dibe bê gotin ku di ristikên li gorî kesê sêyem hatine kêşan de jî (kesê kilam li ser navê wî tê gotin) ew kes behsa xwe dike. Yan jî di rastiya xwe de dîsa li gorî kesê yekem hatiye kêşan û “Êzdînşêr im mîrê/begê Botan im” bi guherîna dangan re îhtîmal heye bûbe awayê kesê sêyem. An jî em dikarin bibêjin di zimanê kilaman de hin qertaf li gorî qafiyeyê dibe bînan bikaranîn.

Mîrektiya Botan di versiyonên kilamê yê gehîştine îro de, ji ber şer û serhildanên Kurdistan ên sedsala 19mîn ku belavê piraniya Kurdistanê bûne, dibe ku zêdetir ji navenda Botan bûne²² û serek û fermandarên wan jî ji mîrên Botan bûne. Yanê kilam piştî ku serhildanên Kurdistan ên nîveka duyem a sedsala 19mîn qewimîne, li vê serdemê hatiye adaptekirin û navdar bûye yan jî cara pêşî di vê serdemê de derketiye. Sebebê borîna navê Êzdînşêr di gelek versiyonên kilamê de û wisa jî hatina wê heta roja me, bi ihtîmaleke mezin ew e ku Êzdînşêr mîrê dawî bû û serhildana wî gelekî girîng bû.

Piştî me bi vî awayî yek ji wateyên ihtimalî anî ziman, di bin pirseke sernivîsî de em ê derbasî wateyeke din a ihtimalî bin.

Dibe ku ev kilam derbarê Şêx Ubeydulahê Nehrî de be?

Ji bo ev pirs bi referansên erênî were berfirehkirin, divê Şêx Ubeydulahê Nehrî, rûmeta wî ya di nava Kurdistan de û girîngiya serhildana ku wî da destpêkirin bîn zanîn. Di dawîya sedsala 19mîn de dema veguherîna dewletên Osmanî û Îranê ya nîv-mêtingeriyê qediya, rewşa Kurdistan a aborî û siyasî jî bi lez lawaz bû. Tevgerên gelî, pevçûnên çekî û êrîş, bûbûn bûyerên jirêzê; desthilatiya rêveberên herêmî yê ji aliyê Osmanîyan ve hatibûn tayînkirin ketibû asteke bi qasî tunebûnê. Bêdesthilatî û aloziyê ji bo ku tevgera rizgariya Kurdistanê ji nû ve xwe gur bike, derfetên bikeys amade dikir (Lazarev û Mihoyan, 2013: 149-150). Piştî şerê rojhilatê ku bi serhildana Êzdînşêr diwartir bû bi bist salan jî hikûmeta Osmanîyan di vê pêvajoyê de ji bo desthilatiya xwe qewî bike li quncik û deverên talde yê Kurdistanê jî tedbirên gelek hişk û dijwar digirtin. Şêx û serekên eşîrên Botan û Hekariyê ji bo serxwebûna xwe ya berê careke din bi dest bixin li benda demeke musaîd bûn (Averyanov, 2010: 139, 140). Di salên 70yî yê sedsala 19mîn de ji nû ve gurbûna “pirsgirêka rojhilatê” û nêzîkbûna şerê Rûsan û Osmanîyan bûn sebebê nexweşiyê li ser rewşa sînorê Îran-Osmanî yê ku Kurdistan parçe kiribûn. Di destpêka sala 1877an de li du eniyên (Balkan û Qafqasyayê) şerê di navbera Rûsan û Osmanîyan de (herba 93an) dest pê kir. Çawa şerê 1877-78an di navbera Osmanî û Rûsan ku li Asyaya Biçûk bûbû sebebê windakirina erdan qediya, Osmanîyan ji bo Kurdên serhildêr bidewisîne, ji nû ve dest avêtin çekan. (Averyanov, 2010: 185-186; Bruinessen, 2005: 278-279; Lazarev û Mihoyan, 2013: 146-148).

22 Cizîr navenda Mîrektiya Botan bû ku yek ji mîrekiyên kevintirîn ên Kurdistanê bû; ji ber li ser riyên ji Anadolê tîr û diçin Îraq û rojhilatê Sûriyeyê bû, bi boneya rewşa xwe ya erdnîgarî di dîroka Kurdistan a siyasî, aborî û çandî de roleke girîng lîstiyê (Lazarev û Mihoyan, 2013: 115).

Dema şerê Rûsan û Osmaniyan dewam dikir, Osmaniyan (Sultan Abdulhamidê Duyem) di vê serdemê de bi niyeta ku dê bandorê lê bike li ser navê pêxember li dij Rûsan şerê pîroz (cîhad) îlan kiribû. Ji ber ku Kurdan bi guman li xelifetiya padişahên Osmanî dinêrîn, gaziya cîhadê ya padişah di nava Kurdan de zêde biwate nebû. Li ser vê Osmaniyan serî li alîkariya rêberên dînî dan ku Kurd hemû hurmetkar û girêdayîyê wan bûn. Şêx Ubeydulahê ji Kurdên Hekariyê, serekê eşîra Oremara biçûk, ji neseba Xalid bin Welîd, niştecihê Şemzînanê û sofîyê Neqşîbendî yê 50 salî, şexsiyetekî (1830-1883) ewqas bijare bû ku ji aliyê piraniya Kurdan ve wek rêberê dînî dihat nasîn. Piraniya Kurdan ew wekî “kesekî pîroz” û warisê rewa yê xelifeyan didît. Şêx Ubeydulahê li tevahiya Kurdistanê di asta ewliyatiyê de dihat dîtin, bû yek ji kesên bersivdar ji bo gaziya cîhadê ya padişah. Şêx Ubeydulah bi yekîneyeke ji murîdên xwe ji Hekariyê ber bi eniyê ve çû. Hin beg û şêxên bakûr-rojavayê Kurdistanê jî destek dan Şêx Ubeydulah. Lê Şêx Ubeydulah û Kurdên tevî cîhadê bûn ruhekî şerker nedan nişan. Şêx Ubeydulah tevî tu hereketên leşkerî nebû, tenê ji bo pêş de li dij serweriya osmaniyan bikar bîne, kete nava hewldaneke mezin ku bandora xwe li ser eşîrên Kurdistana Osmanî û Îranê zêde bike û erdên derdora sînor jî firehtir bike. Hin rêberên din ên Kurd ku tevî cîhadê bûbûn jî helwesteke wiha nişan dan. Plana dawî ya serhildana Şêx Ubeydulah di civîna ku di dîrokê de yekem bû, ji aliyê rêberên Kurdan ve hat amadekirin. Ev komcivîn di hezîrana sala 1880yê de, di bin rêbertiya Şêx Ubeydulah de di hevdîtînen Nehriyê de kom bûbû. Di civîna Şemzînanê ya tebaxa 1880yê de şêx û şexsiyetên din ên dînî ku bi gaziya Şêx Ubeydulah ji çar aliyên Kurdistanê hatibûn, di nava hemû eşîrên Kurdan de tifaqeke giştî pêk hatibû; yanê biryarên giştî yên ku yekîtiya Kurdan saz bike hatibûn tesbîtîkirin. Di hevdîtîna Nehriyê de Şêx Ubeydulah dibêje ku desthilatiya Osmaniyan a li ser alema Îslamê ne rewa ye, xelifeyên Osmanî ne ji nesla pêxember in û ji ber van sebeban li gora şerîetê ew ne dikarin bibin padişah ne jî xelîfe. Li aliyekî din wî gotiye ku dewleta Osmanî lawaz dibe û ber bi hilweşînê ye û divê Kurd ji desthilatiya Osmanî û Îranê xelas bibin; loma ev her du dewlet jî pêşveçûna Kurdan asteng dikin. Şêx Ubeydulahê neteweperwer bawer dikir ku yekane riya ku Kurdan ji wê rewşa bêbext xelas bike, bi yekbûna parçeyên Îran û Tirkiyeyê re avakirina Kurdistaneke serbixwe ye. Şêx Ubeydulah îlan kir ku armanca bingehîn a serhildanê avakirina Kurdistaneke serbixwe ye. Operasyona ku şêx plan kiribû, bi kiryarî di meha tebaxa sala 1880yê de dest pê kir. (Lazarev û Mihoyan, 2013: 146-154; Averyanov, 2010: 143-189, Kutschera, 2013: 28-29; Bruinessen, 2006: 278-279)²³.

23 “Şêx Ubeydulla ji dîplomatên îngilîzan re gotiye ku Kurd “neteweke cuda” ne û ew bi xwe jî hewl didin ku Kurdên Osmanî û yên Îranî bigihînin hev. (Bozarslan, 2005:

Piraniya Kurdan bawer kirine ku binyada padişahên osmanî nagehîje Pêxember û ji ber vê jî ne xelîfeyên rastî ne; dibe ku ev wekî îşaretêkê bê qebûlîkirin ji bo ku fikirîne rêberên wan ên dîni digihîjin pêxember û rêberê wan xelîfe ye.

Konsolosê Erziromê yê kevn ku di dawî de bûye konsolosê Helebê Musteşar Îvanov, di notên xwe yê derbarê Kurdên Botan de wiha gotiye:

“...Tevahiya Kurdistanê îdia dike ku tu carî padişahê Osmaniyan nas nekirine û girêdayê wî nebûne... Kurdên Êzîdî tu demê nebûne Misilman; Kurdên Dêrsimê jî Elewî ne. Ji ber vê jî ne di fikra Êzîdiyan ne jî ya Elewiyan de, bawerîyeke ku sultanê Osmaniyan xelîfeyê Muhemed Pêxember e tune ye û ji ber vê jî ji xelîfetiya Osmaniyan tu berpirsariyekê li ser xwe nabînin. Lê Kurdên Botan xelîfetî û Îslamê wekî hev dibînin, lê îdia dikin ku mafê rewşa yê xelîfetiye heqê xanedana Ebasiyan e, ne ku yê Osmaniyan” (Notên derbarê Kurdên Botan yê konsolosê Erziromê yê kevn ku dawiyê bû konsolosê Helebê Musteşar Îvanov, 1877-78, nql: Averyanov, 2010: 341-347).

“Dema mîrektiyên Kurdan ji holê hatin rakirin li herêma cihê malmezînen mîr û began malmezînen Neqşibendiyan girt. Yanê malmezînen nû derketin. Şêxên Neqşibendî ev xanedan pêk anîn. Van hêza siyasî jî bi dest xistin. Kurê Seyîd Tahayê Nehrî Şêx Ubeydulah ji malbateke girîng bû ku malbat hem ji alîman hem ji ji nesla Ewdilqadirê Geylanî dihat. Seyîd Taha xelîfeyê Mewlana Xalid ê herî girîng bû di Kurdistanê de. Piştî ku Seyîd Taha li gundê Nehriyê (îro navê Tirkî Baglar e) yê li ser Şemzînana Colemêrgê bi cih dibe, li wir xelîfetiyeke mezîna Neqşî ava dibe. Hêza şêxîtiyê ku ji terîqetê dihat a Seyîd Taha û kurê wî Şêx Ubeydulah herêma Kurdan a li Îranê jî di xwe de digirt.” (Hevpeyvîn: Yüksel, 2009).

Di bin nîrxandin û jêgirtinê heta niha de kilama *Ez Xelef im* dibe bê gotin ku derbarê Şêx Ubeydulah de ye û ev rewş bi du ihtimalan dikare bê şîrovekirin. Yekem; Ev kilam dibe ku ji aliyê Şêx Ubeydulah ve hatibe gotin, da ku zêdekirina tevlibûna Kurdan di serhildanê de pêk were, wan motîve bike, cesaretê bide wan û hem jî behsa xwe (hêz, girîngî û navê xwe) bike. Di vê rewşê de Şêx Ubeydulah ji bo bandorê li kesên derdora xwe bike gotiye *ez xelef im* (xelîfe me) û bi vî awayî daye xuyakirin ku nesla wî digihêje Pêxember Muhemed.

202).” Lêbelê tevgera di bin rêbertiya Ubeydulah de ji ber kêmasiyên siyasî, leşkerî û rêxistinî têk çû. Di vê de helwesta Rûsistan, Îngilistan û Osmaniyan jî bi bandor bûye. Di gel her tiştî serhildana Kurdan a 1880yan xwediyê wateya dîrokî ye. Ev, di dîroka tevgera rizgariya Kurdî ya cudaxwazî de û ji bo tevgera rizgariya Kurdî taybetîyeke giştî û Kurdî qezenc bike ne serkeftî bû; lê gaveke cidî bû. Ev tevger, hem ji aliyê siyasî, hem ji aliyê rêxistinî ve ji hereketên Kurdî yê pêşîya xwe astek jortir bû (Lazarev û Mihoyan, 2013: 152-154).

Îhtimala duyem jî bi vî awayî ye; Şêx Ubeydulah xwestiya tevlibûna Kurdan bi hestên xwe yên dînî bo şerê cîhadî yê Osmaniyan ku li dijî Rûsan îlan kiribûn (bi vî jî têkoşîna rizgariya Kurdî dûr bikevin) asteng bike; ji bo Kurdan bike nava serhildaneke mezin gotiye padişahê Osmaniyan ne xelife ye û bi behskirina hêz û navê xwe xelîfetiya xwe bi xwe îlan kiriye. Bandor û rêbertiya dînî, hatina wî ya ji nesla pêxember an jî ku wisa tê dîtin a Şêx Ubeydullah bûye sebeb di nava Kurdan de wekî warisê xelife yê yasayî bê qebûlkirin; ev jî ihtimala ku wî xelîfetiya xwe îlan kiriye zêdetir dike. Di vî rewşê de *Ez Xelefîm* di kilamê de tê wateya “Ez Xelîfe me”.²⁴ Mirov dikare li ser ihtimala îlankirina xelîfetiye, şîroveya ku ev kilam ji bo serhildanên wê demê bûye strana wêrekî, coş û serkeftinê jî, lê zêde bike. Di vî mijarê de ji bo her du ihtimalan jî pirsek tê hişê mirov: Heke kilam di derbarê Şêx Ubeydulah de be, wê demê wateya “Êzdînşêr mîrê Botan e” çî ye? Yanê çima navê Êzdînşêr di kilamê de dibore? Dibe ku sebebê derbasbûna navê Êzdînşêr di kilamê de ew be ku (her çiqas dîl jî be) Êzdînşêr heta wê demê wekî mîrê Kurdistanê dihat dîtin. Yanê Ubeydullah dixwaze bibêje “Ez xelîfe me” û “Êzdînşêr jî mîr e”. Ristika “hawar e mîr” jî dibe ku ji bo ihtimala gaziya xelaskirina Êzdînşêrê dîlgirtî be. Yan jî dibe ku di rastiya xwe de Şêx Ubeydullah gotiye “min hawar e” û ev ristik guheriyê bûye “mîr hawar e”.

Di vî rewşê de kilama *Ez Xelefîm* a ku bi Şêx Ubeydullah dest pê kiriye, di serdemên pey wî de di folklorê Kurdî de cihekî girîng girtiye; ev jî dibe ku ji tîkiliya kesekî wekî Şêx Ubeydulahê rêberekî dînî û siyasî û danerê serhildaneke mezin û berfireh e li Kurdistanê. Sebebê ku tîkiliya kilamê (di şîroveyên îroyîn de) bi Şêx Ubeydulah re nehatiye danîn jî, wiha dikare bê şîrovekirin ku di kilamê de navê wî qet nabore û kilam heta ku hatiye îro derveyê wateya xwe ya rastîn hatiye bikaranîn.

4. ENCAM

Folklor xwediyê taybetiyeke wisan e ku ji serdema dizê û geşedanê dike şopên civakî, çandî û siyasî, carinan yekser û carinan jî neyekeser nîşan dide. Kilama *Ez Xelefîm* jî di folklorê Kurdî de derbarê serdema jê derketiye û navdar bûye de (sedsala 19mîn) şopên dîroka Kurdî yekser di xwe de digire û wekî mînakeke çanda Kurdî ya devkî xwediyê cihekî girîng e. Kilam van şopan yekser di xwe de negire jî, bi wateyên ihtimalî yên ji wateyekê zêdetir, di dîroka Kurdî de derbarê mijarên curbicur ên wekî şexsên girîng, bûyer û qewimînan de, hebûna taybetiyên cuda piştrast dike, an jî mirov digihîjîne daneyên dîrokî yên ku heta îro li ser nehatine sekinîn.

24 Dibe ku “Ez Xelîfe me” bi demê re guherînên dangan pêk hatibe û bûbe “Ez Xelefîm”

Di beşeke mezin a çavkaniyên dîroka Kurdî yên nivîskî de, dîroka Kurdî ya sedsala 19mîn serdema derketina neteweperweriya Kurdî, destpêka tevgera netewetîya Kurdî û dema jiyaneke pir livîn a xelekek şer, serhildan, berxwedan û têkoşîna rizgariyê ye. Kilama *Ez Xelef im* di çarçoveya vê xebatê de, digel gelek wateyên îhtimalî ku li ser hat sekinîn, îşaretî xaleke hevpar a van hemû îhtimalan dike: Ev kilama ku di hafizeya Kurdî ya devkî de xwediyê wateyeke destanî ye, dikare bê gotin ku şewqdana vê livdariya dîroka sedsala 19mîn a di folklorê de ye. Yanê çî berî Êzdînşêr çî jî di serdema wî de derketibe, an jî derneketibe û armanca kilamê çî dibe bila bibe, dikare bê gotin ev kilam di serhildan û têkoşîna rizgariya Kurdî de xwediyê taybetîya marşeke serkeftin, qehremanî, wêrekî û berxwedanê ye; an jî bi demê re ev taybetî girtine nava xwe. Di hafizeya devkî ya Kurdî de ji ber ku îro jî kilam xwediyê vê wateyê ye, ev îhtimal piştrast dibe. Li aliyekî din, girîngiya kilamê ya ku ji berê ve heta îro di nava Kurdan de hebûye jî, divê ji ber dîrok û wateyeke wiha ya kilamê be.

5. ÇAVKANÎ

- Averyanov, P.İ. (2010). *Osmanlı İnan Rus Savaşlarında Kürtler (19. Yüzyıl)*. Çev: İbrahim Kale. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bozarlan, H. (2005). *Türkiye’de Kürt Milliyetçiliği Zımni Sözleşmeden İyana (1919-1925)*. Vali, A. (Ed.), *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri (199-229)*. İstanbul: Avesta.
- Bruinessen, M.V. (2006). *Ağa, Şeyh, Devlet (4. Baskı)*, Çev: Banu Yalkut. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Celil, C. (1992). *19. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu’nda Kürtler*. Çev: Mehmet Demir. Ankara: Özgü Yayınları.
- Cigerxwîn. (1988). *Folkloru Kurdî*. Stockholm/Sweden: Weşanên Roja Nû.
- Çelebi, N., Yıldırım, V., Ataş, A.G. (2006). “Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış”, *BGST*. (<http://bgst.org/kurtce-muzik/geleneksel-kurt-muzigine-genel-bir-bakis->).
- Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)*. Çev: İbrahim Bingöl, Cemil Bindoğan. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Jwaideh, W. (2014). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi (8. Baskı)*. Çev: İsmail Çekem-Alper Duman. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kardam, A. (2011). *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan Direniş ve İsyân Yılları (2. Baskı)*. Ankara: Dipnot Yayınları.
- Kardam, A. (2013). *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan Sürgün Yılları*. Ankara: Dipnot Yayınları.
- Kutschera, C. (2013). *Kürt Ulusal Hareketi (2. Baskı)*. Çev: Fikret Başkaya. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Lazarev, M.S., Mihoyan, Ş.X. (2013). *Kürdistan Tarihi (4.Baskı)*. Çev: İbrahim Kale. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Mele Xelefê Bafî. (2005). *Dîroka Kelepura Mirnişîniya Botan*, (Veguhestina Tîpan: Dilawerê Zengî, Derhêner û Kombiyûter: Royar Zengî). Beyrûd- Libnan: Çapxaneyê Emîral.
- Nora, P. (1989). “Between Memory and History: Les Lieux de Mêmorie,” *Representations* 26, Special

Issue: Memory and Counter Memory, Spring, pp. 7-24.

Şerefhan, (1990). *Şerefname*. Çev: M. Emin Bozarslan. İstanbul: Hasat Yayınları.

Öğün, T. (2010). *Doğu'nun Mirlerine Son Veda: Cizreli İzzeddin Şir Bey ve İsyanı*. İstanbul: Yeditepe Yayınevi.

Yüksel, M. (2009). "Kürtlerdeki Ulusalçı Damar" ya ku hevpeyvîn kiriye: Aynur Aydoğan, Dünya Bülteni (12.09.2009).

Extended Abstract

Kurdish oral cultur sepecially Kurdish traditional music has a great of importance as being a source of Kurdish history. In this sense, although there isn't any certain information about its meaning *Ez Xelef im* song as being one of the popular represantive of Kurdish folk song is a verbal sourche to clear and examine the nineteenth century which the most important developments of Kurdish history occured.

Nineteenth century which is handled by most of the writing history sources about Kurdish history as the birth of Kurdish nationalism and beginning of Kurdish national movement is a rather moving period for the Kurdish history. It can be said that *Ez Xelef im* song which has a epic meaning in Kurdish verbal memory is a reflection of that moving period of ninetenth century Kurdish history. Because this song almost has a rhythm and content that reflect the the wars, political and politics development in Kurdistan during nineteenth century. These developments mainly include a number of uprising, resitance and liberation struggle. Therefore there is a very strong posibility to say that this song was as a resistance and victory march for Kurdish people which motive them to war during this moving period

From another angle this song also has a lot of hints which provide thinking about developments never handled by written history of Kurdistan and provide evaulating some events and persons which registered to written history by a non-objective way with a new perspective. The most important historical figuras of nineteenth century of Kurdish history which we can rethink about by this song are Şêx Ubeydullah and Êzdînşêr (Yezdanşêr). Although he is a hero figure in Kurdish local memory and verbal cultur Êzdînşêr is entitled by the writing history as a traitor. And writing history has a very limited information about Êzdînşêr. Şêx Ubeydullah is one of most important figure of ninetenth century Kurdish history and he is the leader of the last and most important Kurdish uprising which ocur in that century. But alike Êzdînşêr writing history has a limited information about it, too. When analyzed *Ez Xelef im* as a verbal source it can offer new informations and viewpoints about these two historical figure. This case shows as that verbal history and verbal cultur can be both a source or contemporary of writing history and a critic of writing history. Specially publics like Kurdish whose writing history registered late and mostly with non-objective needs verbal sources more.

This article's aim is to analyze a traditional folk music via a period of Kurdish history and present new informations and viewpoints about some events and historical figures of Kurdish history. And finally emphaize the importance of Kurdish verbal cultur as being a source of history. According this purpose it was benefited both writing and verbal informations and personal observations for analyzing *Ez Xelef im* folk song.